

Azadîa rastî çi ye?

Li ser wan evêt bawerî dayê, berî hemî tiştê, ew di dest pak bin. Bawerî êk ji pitir tiştê zehîmet e da bînit ve hevaletî piştî berze kir. Bawerî têt înan ji qadirê miruvekê ji ber navdarîek baş u bawerî jî têt înan ji ber beîsa başî. Bawerî dişê zî berze bikî ji ber xapandin, bi nimûne dehmen pîsî kirin yan drew kirin. Dişê berze bikî ji ber karê 'ecêbî yan leşîn. Bawerî berze dîkî wextê êkê bi devê xû cîranê xû bi axiftinê aştê diaxivî, belê di dilê xû da ewî bustek ya bu vedaî.

Heker te şula xû veşart yan dilê êkê êşand, pêtivî ye tu aşkira gunnehê xû bikî u tube bikî. Heker êkê şula xû veşart yan dilê te êşa, pêtivî ye tu wan biburî. U paşî pêtivî ye tu hê ji wan miruva bikî. Heskîrin bu bawerîa berze dermanê dijî jehrê ye. Heskîrin hemî tiştê diparêzî u hemî tiştê bawer dîkî u her bi hîvî ye u xû li ber hemî tiştê digirî, u çi cara wêran nabit.

Heker tu ne şê rêkê xû bi xû biguhurrî – heker tu ne şê li miruvê dî bi xû biburî – pêtivî ye tu ji Xwidê bixazî da harî karîa te bikî. Xwidê xûştivî ye, u ewê di xûştivî da xû ragir bit, digel Xwidê xû ragir dibit u Xwidê digel wî xû ragir e.

Miruv dê her dem hîvîet me şikênî çunku miruv gunnehbar in. Belê Xwidê baş e. Li roja tengavî kelh e u ewan nasdikî ewê xû yê digirin. Belê ew dest bi pakîyeka dirist dîar bikî.

Heker te gunneh kir – u ji ber hindê azadîa dilê te naet – pêtivî ye we bike wekî Daûd pêxember we kir: Aşkîra gunnehê xû bike. Du'akîra Daûdî wextê ew aşkira gunneha dehmen pîsî u kuştinê kir bixwîne. (Ew çîroke li ser perê êkê ye.)

“Ey Xuda, bi gureî diluvanî ya xû diluvanî min bibe, u bi gureî dil nêzikî ya xû gunnehê min ne hê. Min bi êk carî ji gunnehê min bişu, u min ji gunneha min tafîr bike.

Ez aşkirayê bi gunnehê xû dikim, u gunneha min her dem li pêş çavê min e. Min di derheqê te tinê da xeletî kir, u xirabî li pêş çavê te kir, daku demê tu xukimî dikî. Tu xukimî bi dadperwerî vebirî, u demê diaxivî rast bêjî.

Eve ez bi gunnehê ji dayk bîm, u bi gunnehê deyka min bi tişt keft. Eve te divê tu rastî dinav xû ya miruvî da bibînî, u danayî di deruna min da nîsa min bidî.

Ey Xuda, dilekê paqîj dinav min da çêke, u gîaneka rast dinav min da nî jeng bike. Tu min ji xuzîra xû der ne êxe, u Gîana xû ya pîruz ji min ne stîne. Xuşî ya min bi qurtalîa xû li min vegerîne, u bi gîanê piştî min bigire. Hîngê dê gunnehbar rêkê te zanin, u yê gunnehkar dê pêşeman bin.

Ey Xuda, tu min ji rîştina xwînê biparêze, ey Xudayê qurtalkirîna min, u dê ezmanê min bi rastî u başîa te velurînit. Ey Xudan, lêvê min veke, u devê min dê beîsê supasîa te kit u belav kit.

Tu bi çi gurîa keyf xûş nabî, heker ez da pêşkêş kim, u bi çi sutîa razî nabî.

Ew gurîet Xwidê dixwazî, ew gîanê şikestî ne, u dilê şikestî çepel ne kin, ey Xuda.”



- Zebura 51:1-6, 10-17